

Şikesta Kerkûkê destpêka rabûneke din

»»»» R:6



Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (313) 06-11-2017 Buha (1000) Tûmen



Mistefa Hicrî:
Nabe ku em çaverê bin ku hikûmetên derve bên û Komara Îslamiya Îranê bi-herifînin...

»»»» Dom R:4

Rewayiya çek û rewayiya xelkê

»»»» Dom R:2



Di hemberî rejîma Îranê de, hevalbendiyek tê avkirin



Netanyaho serokwezîrê Îsraîlê îşare bi vê kiriye, ku di navbera welatên Erebî ên Kendawê û Îsraîlê de hevdengiyek heye, û di vê derheqê de, mijûl e ku yekîtiyek pêk tê.

Navbirî roja 11`ê Xezelwerê bi boneya 100.mîn salvegera ragehandina "Balfour Declaration" serdana Berîtanyayê kir, û di vê seferê de digel " Theresa May" hevdîtin pêk anî.

Navbirî di vê serdana xwe de li "Chatham House" basek li ser Îranê û destêwerdanên wê li navçeyê de pêşkêş kir, û ragehand: Welatên Erebî û Sunî meseb ku di derbazbûyî de digel Îsraîlê şer û nakokî hebûne, niha ji vê têgihîştine ku Îsraîl di hemberî bihêzbûna rejîma Îranê di Rojhilata Navîn de hevpeymaneke baş e.

Netanyaho rû li Potîn serkomarê Rûsiyê ragehand: Di berjewendiya Mosoyê de nîne ku deshilata Îranê li Sûriyê û navçeyê de reh û rîşeyê dakute.

Serokwezîrê Îsraîlê li ser xerîteya "Chatham House" şirove kir ku Îran dixwaze ji Tehranê ve heya bendera "Tertûs" li Sûriyê riyekê veke, û hevdem bi piştevaniya Hûsiyan li Yemenê de bi ser ava "Beb El-mendebê" de zal be.

Herwisa Netanyaho îşare bi vê kir ku di dema serkomariya Obama de, li ser Îranê pêwendiyên me aloztir bûn, jiber ku Obama li ser vê baweriyê bû ku rejîma Îranê beşek e ji rêçareya kêşeyên Rojhilata Navîn, di demekê de ku Îsraîl li ser vê baweriyê bû ku rejîma Îranê bixwe kêşeya serekî ye.

Netanyaho ku pêştir daxwaza hilweşandina Bercamê dikir, di vê seferê de daxwazkarê destkarîkirin û vêdebirina kêmasiyên vê rêkevtinê dike, û ragehandiye:

Ew rêkevtin tu girîngiya wê nine, tenê ya girîng ew e ku Îran destên wê negihîje çeka navikî, û hekî di vê derheqê de xemsarî bê kirin, emê digel gefeke metirsîdartir ji Kureya Bakûr berbirû bibin. Ew hewlên Netanyaho bo destpêrenegihîştina rejîma Îranê bi çeka navikî û pêdagiriya YE li ser mana Bercamê, di demekê de ye ku Xamineyî roja Pêncşemiyê 11`ê Xezelwerê ragehand: Îran amade nine ji vê zêdetir li ser Bercamê gotûbêjê bike, û em rê nadin ku Ewropa bi hêceta bernameya vegeşandina mûşekî, Îranê bo aliyê danûstandinan rabikêşe.

Se`id Herîrî gefan li Îranê dixwe



Serokwezîrê Lubnanê "Se`id Herîrî" dest ji kar vekişand û ragehand ku, ewê destê rejîma Îranê di herêmê de qut bike.

Li gora raporên belavbûyî serokwezîrê Lubnanê, piştî evê ku dest ji post a serokwezîriyê vekişand tekezkir ku, îznê nadin ku bera çekên Hizbullaha Lubnanê bidin aliyê hemwelatiyên wî welatî û yên Sûriyê.

Navbirî herwiha bas ji vê yekê jî kiriye ku, rê nadin Lubnan bibe gef li ser welatên herêmê, û destê Îranê di deverê de qut dikin, ji berku rejîma Îranê, hewl ji bo hiloşandina welatên Erebî dide. Di her cihekî de ku destê rejîma Îranê hebe alozî û wêranî dirust dibe.

Herîrî heyamekê berî niha jî bas ji vê kiribû ku; Rejîma Îranê sebebkarê serekî a têkdana aramiya welatên Îraq, Sûriy û Lubnanê ye, û herwiha ev rejîma sebebkarê dirustbûna tayifegeriyê ye, û herwiha rejîma Îranê gefek li ser yekbûn û jiyana nivşa pêşerojê da.

Refîq Herîr, bavê Se`id Herîrî yek ji serkirdeyên payebilind ê Lubnanê bû, û wê demê ku serokwezîbû, di rêkevta 25`ê Rêbendana 1382`an de, di encama kiryareke terorîstî de jiyana xwe ji dest da.

www.arsiv.org

Sergotar

Rewayiya çek û rewayiya xelkê

N: Kerîm Perwîzî



Efserekî hêza Qacarî, perwerdê destê hêzên Berîtanyayê derbe (kûdeta) li paşatiya Qacarî kir, û hikûmeta Komarî ragehand, û piştre ku axûndên Şî`e li dijî vê sîstema Komarî sekinîn, cardin ew sîstem kire paşatî, lê vê carê paşatiya pehlewî! (Rezaxanê Mîrpenc) ku piştre xwe kire Reza şah, arteşeke peyt û mezin ava kir, û bi rênîşandana derekî, bi derba hêz û arteşa yekdest, xwest ku hemû "memleketên mehrûse ên Qacarî" ku kiribûn "memleketên mehrûse ên pehlewî", li jêr yek ala û yek fermanê de bi rê ve bibe, û deshilata "yek dewlet" û "yek netewe" pêk bîne.

Bi derba çek û arteşa zalim bîst salan hukim kir, lê di dema hatina hêza Mutefiqîn de, arteşa rizî hilweşiya, û hemû reviyan!

Hikûmeta Be`is ya Sedam, ew arteşa peyt û bihêz, sertaserê Îraqê xiste bin kontrola xwe de, û çendîn şerên navçeyî kirin, lê di sala 2003`an de li hemberî êrîşa derekî de, tenê 21 rojan karî xwe ragire, herçend zûtir jî rûxa, lê hêzên derekî hez dikirin ku arteşa Îraqê bi tewahî tune bikin!.

Di 2011`an de Malikî hakimê Bexdayê arteşa Îraqê bi çek û cebilxaneya Amerîkayî teyar kiribû, û operasiyona Dîcle ragehand û xwest ku Kurdistanê pê bigre, 1000 terorîstên DAÎŞ`ê hatin nava Mûsilê, û arteşa rizî ya Malikî heya Bexdayê reviyan!.
Piştî vê ku Xomênî hate ser kar, fermana cîhadê li dijî gelê Kurd derkir, û tewahiya îmkanatên mirovî û siyasî û aborî û olî ên xwe ji Spaha Pasdaran re xerc kirin, û hêz şande ser Kurdistanê heya ku Kurdan pê serkut bike, û Kurdistanê dagîr bike.

Niha piştî 38 salan ku bi ser êrîşa Spaha Pasdaran li ser Kurdistanê re derbaz dibe, hêşta di nava bajarên Kurdistanê de tank û mûşekan û çekên giran nîşan didin, û binkeyên leşkerî ên Spaha Pasdaran di nava dilê bajarên Kurdistanê de rûçikê bajaran têk dane, û beşek ji bajar dagîr kirine, û herçend mehan carekê bi hêcetekê, bi hêza xwe û kirêgirtiyan di nava bajaran de manoran didin. Piştî 38 salan hêşta jî bi tank û top û mûşekan berbirûyê ciwanên Kurd dibin, û di nava kolanên bajar de çeperan lê didin!.
Renge çek û cebilxane û arteşa mezin ya serkutkar û Spaha Pasdaran ya terorîst bikarin ku deshilata îdeolojîk û dîktatorî ya xwe li ser xakekê bisepînin, lê qet nikarin bi ser xelkê de hikûmetê bikin, jiber ku ew xelk tenê li ber parastina canê wan e ku renge bo heyamekê bêdeng bin, lê rojekê bêzariya xwe ji vê dagîrkariyê wê nîşan bidin. Ew hêzên kartonî ên wekî arteşa Reza Şah û Spaha Be`is û artşa Malikî çi hate serê wan, pêşeroja Spaha Pasdran û arteşa Îraq a niha jî ku dixwaze bi bi çek û serkutê hikûmetê bike, her wekî ên din dibe, jiber ku çend bihêz jî bin, ji arteşa xwedî çek a etomî ya Soviyetê bihêztir nabin, ku piştî 14 salan dagîrkariyê bi neçar Efxanistana dagîrkirî bi cih hêlan, û di hemberî nerazîbûna xelkê Soviyetê de jî nekarîn xwe ragirin, û di şev û rojekê de hikûmeta dîktatoriya Piroltariyayê têk dan.
Çek û cebilxane renge çend rojan dagîrker biparêze, lê qet rewayiyê bo hikûmetê nahîne, hikûmetek ku nekare dilê xelkê bi dest bixe, encama wê her hiloşîne.



Beşdariya şandeke Deftera Nûneratiya PDKÎ di mersima şehîdên Zomarê de



Şandeke Deftera Nûneratiya PDKÎ a bajarê Hewlêrê, beşdarî di merasima şehîdên Zomarê de kir.

Şandeke Deftera Nûneratiya PDKÎ, li merasima şehîdên Leşkera Roj, ku di berevanîkirina bajarê Zomarê de şehîd ketibûn, beşdarî kir.

Şanda Nûneratiya PDKÎ, bi serperestiya "Mihemedsalih Qadirî" berpirsê Deftera Nûneratiya PDKÎ li bajarê Hewlêrê, beşdarî di merasima şehîdên bajarê Zomarê de kir, û bi navê PDKÎ sersaxî li serokê "ENKS"ê û endamên Encûmena Nîştimanî û malbata şehîdan kir.

Nûnerê PDKÎ, qaremanî û helwêsta pêşmergên "Leşkera Roj" di pêxema berevanîkirin ji Kurdistanaê de cihê serbilindiyê da zanîn, ku ji bo parastin ji ax û serweriya Başûrê Kurdistanê li hember êrîşên neyaran canê xwe fîda kirine.

Di wî şerî de, 8 pêşmergên "Leşkera Roj" a ser bi "ENKS"ê şehîd ketine, û çend pêmergên din jî birîndar bûne.

Şanda PDKÎ ji aliyê "Birayîm Biro" serokê "ENKS"ê û endamên serkirdayetiya wê ve, pêşwazî ji wan hate kirin.

www.arsivakurd.org

PDKÎ û Hizba Şiyû`î a Kurdistanê civiyan

PDKÎ digel şandeke Hizba Şiyû`î civîn pêk anî, û derbarê pirsên rojevê de gotûbêj kirin.

Di roja 13`ê Xezelwera 1396`an de, şandeke Hizba Şiyû`î a Başûrê Kurdistanê, bi serperestiya "Ebû Tara" serdana Deftera Siyasî a PDKÎ kir, û ji aliyê "Mistefa Hicrî" û hejmarek ji endamên rêberayetiya Hizbê ve pêşwazî ji wan hate kirin.

Rêzdar Ebû Tara armanca serdana xwe ya bo Deftera Siyasî ya PDKÎ, vegerande ser hevdîtina hevalên hizbî, wekî dostên dîrokî yên hizba Şiyû`î, û herwiha di civîneke dostane de, axavtineke siyasî kir derbarê rewşa Kurd û bitaybetî êrîşên dewleta Îraqê, û hevpêymanên wê ên deverê bo ser bajarê Kerkûkê, û deverên kurdistanê û herwiha bêdengiya hevpêymanan derheq şevitandina serwet û samana xelkê, ku di encamp de xelk neçar man warê xwe bi cih bihêlin.
Di vê civînê de, îşare bi berdewam-



bûna pîlanên neyarên Kurd ji bo têkbirina destkevtên siyasî û neteweyî ên Kurd li Başûrê Kurdistanê û bandora nerînî a wan pîlanan li ser hereketên mafxwazî ên gelê Kurd di beşên din yên Kurdistanê de hate kirin.

Herwiha di vê hevdîtinê de, carekî din jî li ser wan rastiyan tekez kirin, ku tenê riya berbirûbûna digel neyarên Kurd, yekbûn û yekrêzbûna partî û aliyên siyasî ên Kurdistanê û piştgirêdana bi hêza xelkê Kurdistanê ye, û herdu şandên dost di dawiya vê civînê de li ser pêwendiyên siyasî ên xwe tekez kirin û "Mistefa Hicrî" spas li serdana dostane ya hizba Şiyû`î kir.

Endamekî PDKÎ çû ser dilovaniya xwe

Endamekî berê yê PDKÎ, di bajarê Mehabadê de çû ser dilovaniya xwe.

Li gora rapora gihîştî malpera "Kurdistanmedia"yê, di roja Înê 5`ê Xezelwera 1396`an de, "Husên Bayezîdî Azer" xelkê bajarê Mehabadê, bi sedema kalbûnê çû ser dilovaniya xwe.

Navbirî kesekî hezkirî û cihê baweriyê di nav xelkê deverê de bû, û heta dawîn demên jiyana xwe bi riya Demokrat wefadar bû.

Termê navbirî di nav girseya xelkê deverê de, bi axê hate spartin. Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, sersaxiyê dibêje, malbat, xizm û kes û karên navbirî û xwe şirîkê xema wan dizane.



Dayîka şehîdekî PDKÎ çû ser dilovaniya xwe

"Xedîce Îsma`îlî" dayîka şehîdekî PDKÎ, çû ser dilovaniya xwe.

Li gora rapora gihîştî malpera "Kurdistanmedia"yê, "Xedîce Îsma`îlî" xelkê gundê "Visûkendî" a devera Şarwêrana girdayî bajarê Mehabadê, û dayîka şehîd "Îbrahîm Çabuk" roja Duşemî 8`ê Xezelwera 1396`an di temenê 92 saliyê de, çû ser dilovanya xwe.

Termê Xedîcê di nav girseya xelkê deverê de, bi axê hate spartin.

Şehîd "Îbrahîm Çabok" di meha Cuzerdana 1360`î de, di binkeya leşkerî ya "Çêrî Spî" a ser bi gundê "Giwêg Tepe" a bajarê Mehabadê , di şerê li dijî dagîrkerên Kurdistanê de, şehîd bûye. Mala dayîka Xedîcê, cihê bêhnvedana hemû Kadr û pêşmergên hêzên "Pêşewa" û "Qendîlê" bû.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, sersaxiyê dibêje malbat, xizm û kes û karên xatûna Xedîcê, û xwe şirîkê xema wan dizane.



"Bazên Zagros"ê çalakiyeke çekdarî bi rê ve birin

"Bazên Zagros"ê di bajarê "Şino"yê de, di emeliîyatekê de, binkeyeke kirêgirtiyên rejîma Îranê hiloşandin.

Malpera "Bazên Zagiros"ê, di raporekê de belav kirine, ku şeva Çarşemî demjimêr 11`ê şevê binkeyeke kirêgirtiyên rejîma Îslamî a Îranê, di gundê "Şêxan" a girêdayî bajarê "Şino"yê de kete ber êrîşa Teyrebazên Zagrosê.Li gora rapora Teyrebazên Zagrosê, êrîşa li ser binkeya kirêgirtiyên rejîma Îranê, demeke dirêj dim kir, û piştî êrîşê "Teyrebazên Zagros"ê bi bê tu xesarekê, cihê bûyerê bi cî hêştin.
Herwiha li gora vê rapora malpera Teyrebazên Zagrosê, du Ambolansên dijminm ji şefeqê ve, di navbera bajarê Şino û gundê Şêxan de, hatûçûn kirine.



Hevpeyvînek digel sekreterê giştî ê PDKÎ derheq stratejiya nû ya Amerîkayê di hemberî Îranê de



Mistefa Hicrî:

Nabe ku em çaverê bin ku hikûmetên derve bên û Komara Îslamiya Îranê biherifînin, yan Komara Îslamî neçar bikin ku mafê me bide, dibe em bixwe bibandor bin, û Rojhilat dibe ku bibe hêzeke bibandor

Stratejiya nû ya Amerîkayê li hemberî Îranê û pêşwazî û piştevaniya PDKÎ ji vê stratejiyê, tewera sereke ya gotûbêjeke taybetî ya TISHK TV ye, digel rêzdar Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ ku eva jêr deqa vê ye.

H: Sabir Fetahî

Pirs: Dawî stratejiya Amerîkayê li hemberî Îranê hûn çawa dinirxînin?

Bersiv: Tramp çi di bangewaza hilbijartinê û çi jî di heyama van deh mehên serkomariyê de, berdewam nerazîbûna xwe derheq rêkevtina Bercamê de, ku pêwendiya wê bi pirograma etomî ya Îranê ve heye, nîşan daye, û niha jî di hewlê de ye ku ew sozên ku di bangewaza hilbijartinê de dabû xelkê, cîbicî bike. Tramp ser vê baweriyê ye ku ew rêkevtin nivîşkan e û dibe ku pêdeçûn bi ser de bihê kirin, bo vê ku garantiya destpêregihîştina Komara Îslamî bi çeka etomî misoger bike. Niha ew mesele bi kongireyê spartiye, da ku biryarê li ser bide, û heya du mehên din encama danûstandinên xwe ên digel dewletê wê ragehîne, û hekî negihîjin encamê, Tramp bixwe yekalî wê ji vê rêkevtinê vekêşe. Derketina ji vê rêkevtinê wê gellek kêşeyên mezin derheq gemaroyan de wê ji Îranê re çê bike. Xeynî rêkevtina Bercamê pirsa Spaha Pasdaran jî heye, ku niha xistine jêr gemaroyan de, jiber ku pêştir tenê Spaha Quds ya ser bi Spaha Pasdaran li bin gemaroyan de bû. Ew daxwaziyên din ku Tramp daxwaza wan dike ew e ku dibe Îran stûxwar be li hemberî wê de ku alîkariya terorîzma navçeyî neke, û detsêwerdanê di nava karûbarên cîranan û Îsraîlê de neke, û îznê bide ku çavdêriya navendên leşkerî û mûşekî ên Îranî bihê kirin. Ew yek ew tewer in ku em wekî PDKÎ bi sala ye em daxwaza wan dikin, û em dibêjin ku Komara Îslamî rejîmeke terorîstî ye, û hewl dide bo bidestxistina çeka navikî. Rêkevtina Bercamê bûye sedema vê ku derfeteke din bo Komara slamî bê pêş, pereyên bilokirî ên wê di bankên Amerîkayê de radestî Îranê bêne kirin, û hemûyê jî bo kar û kiryarên terorîstî û têkderiyê di nava karûbarên herêmê de bi kar tîne, em kêfxweş in ku niha hikûmeta Amerîkayê gihaye vê qenaetê li ser Îranê ku em bi salan e bas jê dikin. Em pêşbînî dikin ku bernameya Tramp bibandor dibe û derfeteke baştir bo hemû azadîxwazên Îranê û bi taybetî bo Kurdan pêk tîne ku em xebata xwe li dijî rejîma Îranê vegeşînin.

Pirs: Wekî we kerem kir, Tramp di bangewaza xwe de bas ji hiloşandina Bercamê dikir, lê heya niha nekariye vî karî bike, gelo hewlên wî têrê nekirine, yan jî qonaxên yasayî hewce ne ku bibire da ku bikare wê hiloşîne?

Bersiv: Ya ku niha Tramp digel de berbirû ye, cuda ye, digel ya berî hilbijartinê û di serdema serkomariya Obama de, hemû welatên Ewropî hevdeng bûn li ser tehrîmxistina li ser Îranê bi awayekî ku Komara Îslamiya Îranê teslîm be û bê ser maseya gotûbêjê, û îmtiyazan jê bistîne. Di wê demê de ew serkevtî bûn, û pêkve ligel welatên Ewropî Komara Îslamî neçar kirin ku vê girêbestê îmza bike, lê ya ku Tramp îdia dikir, ku ewê rêkevtinê bidirîne û li bin de derdikeve, wisa xûya ye ku niha berjewendiya wan di wir de ye ku rêkevtin di cihê xwe de bimîne, lê ew yek bê reformkirin, û ew yekgirtûyiya ku hevpeyman û hevakarên Amerîka li Ewropa de pêştir li ser rêkevtina Bercamê hebûn, niha nemaye, niha daxwaziyên wan ew in ku pêwendiya wan digel Îran asayî bin, û ew bazerganî û sermayeguzariya xwe di Îranê de bikin, û ew qazanc û berjewendiyên ku di Îranê de dibe para wan ew jê bê par nebin, di heman demê de ew hevalbend jî pêdagirî dikin ku nabe Bercam bihiloşe, lê ew jî ku pêdagir in ku Komara Îslamiya Îranê dibe destêwerdanên xwe di herêmê de bidawî bîne.

Pirs: We bas ji destêwerdanên Îranê kir, her du rojan piştî stratejiya nû ya Amerîkayê û gotinên Tramp me dît ku Îranê bi alîkariya Heşda Şe`ibî hat û beşek ji navçeyên Başûra Kurdistanê dagîr kir, gelo ew yek çi digehîne?

Bersiv: Bê guman Komara Îslamî jî nerazî ye bi vê bernamê ku îdareya nû ya Amerîka dixwaze li dijî wan bibe pêş, û ew jî dixwaze ku dijkirayê nîşan bide, ku di wir de ye ku şer û pevçûn wê rû bide. Lihevketin yan pevçûn şert nine ku hetmen bi awayê leşkerî be, lê ew reftarên Komara Îslamî û ew pêdagiriyên li ser domandina bernameyên şaş ên xwe di herêm û di cîhanê de, dikarin bibin sedema vê ku dubare Tramp di nava hevpeymanên Ewropî de, hevpeymanan bo xwe bi dest bîne, û bikare digel wan zextê bixin ser Komara Îslamî ya Îranê.

Pirs: Di pirsa berê de min bas ji vê kir ku Tramp nekariye piştevaniyeke wisa bi dest bîne bo biryarên nû ên xwe, gelo we jêve ye ku welatên 5+1 li hemberî vê biryarê de bisekinin?

Bersiv: Li hemberî hiloşandina Bercamê de disekinin, lê li hemberî gemaroyên din ên Îranê cuda ji bernameya etomî û bi boneya vê ku Spaha Pasdaran hêzeke terorîstî ye û cinayetan dike, dijberiya xwe digel Îsraîlê her dirêjiyê pê dide, û destêwerdanê di nava welatên navçê de dike, û roj bi rojê zêdetir nifûza xwe zêde dike, welatên din ên cîhanî û bi taybetî ên Rojavayî digel de hevdeng in. Dibe ku em li vir de hûrbîn bin ku pirsa Bercamê digel serpêçiyên din ên Komara Îslamî cuda ne, û Ewropî hizra wan û boçûna wan ew e ku nabe Bercam bê hiloşandin, lê ew jî alîkariya Amerîkayê dikin, ku dibe bê îslahkirin, Armanca eslî jî ew e ku ew girêbest di serdemê Obama de hatiye amadekirin, ku piştî 10 yan 15 salên din, ku baş li bîra min de nine, Îran dubare dikare Oranyomê bimehîne, û bi awayekî wê destên wê bigihîje çeka etomî. Dixwazin wisa pêdeçûnê bi ser de bikin ku Komara Îslamî nekare çeka etomî bi dest bîne, û di vê de jî Ewropî jî alîkariyê dikin, ji bilî vê basa din, dikeve ser wan gemaroyên ku dixwazin bixin ser Îranê, derheq serpêçiyên din de ku di herêmê de min bas kir.

Pirs: Di axavtinên Tramp de zêdetir ji deh caran navê Spaha Pasdaran hat û Wezareta Xizînedariya Amerîkayê jî, gemaro xiste ser vê hêza terorîstî, we kerem kir ku hekî ew biryarên Tramp bêne cîbicîkirin, xebata xelkê Îranê û kurdên Rojhilat jî wê bigihêje encamê, lê hekî kongirês berevajiyê Tramp biryarê bide, wê çi encamek heb?

Bersiv: Ya ku niha di ber dest de ye û heye, emê bas ji vê bikin, gellek zehmet e ku em bikarin pêşbîniya pêşerojê bikin ku wê çi lê bihê, eva ku niha di gorê de ye, ewe ye ku

li gra qanûna Ewropa kongire dibe da ku heya du mehên din ew me`imûriyeta serkomar cîbicî bike da ku di bara Bercamê de nezera xwe bêje, ku gelo kongire gel de ye ku Amerîka ji vê rêkevtinê vekêşe yan na, niha Tramp dibêje ku hekî Bercam negiha encamê, yekalî ewê ragehîne, ku ji vê rêkevtinê wê vekişe, û di biyavê yasayî de jî dikare vê yekê bike, lê min jêve ye ku karekî rast û baş kiriye ku erkek bi kongirê spartiye bona vê ku hevkariya kongirê jî bi aliyê xw erakêşe, piştî vê jî çi bi ser de tê, em nikarin pêşbîni dikin, lê li gora vê siyasetê ku heya niha Tramp ragehandiye, min jêve ye ku aliyê kêm ya karê ku derheq rêkevtina Bercamê tê kirin ew e ku reform bikin, ew xalên ku hikûmeta nû ya Amerîkayê jêve ye cihê gumanê ne, û derfetê dide Komara Îslamî di poêşerojê de çeka etomî bi dest bîne, îslah bikin da ku nekare bi dest bîne, hekî ew yek nebe, her wekî Tramp ragehandiye renge yekalî ragehîne ku ji rêkevtinê tê der.



Pirs: Spaha Pasdaran gemaro ketiye ser, lê hekî bixin nava lîsteya reş de, xebata xelkê Rojhilat wê bigihîje kuderê, yan jî encama xebata xelkê Îranê wê çi bi ser de bê?

Bersiv: Dibe ku meseleya Komara Îslamî, em yekparçe berçav bigrin ku Spaha Pasdaran jî beşeke bihêz ya vê rejîmê ye, dema ku ew rejîm li jêr gemaroyan de be, lawaz dibe, û derfeta xebata cidîtir bo xelk li dijî vê rejîmê çê dibe, rejîma Îranê neçar dibe ku dest û piyên xwe dirêj neke, û destêwerdanê di nava karûbarên welatên cîran de neke, û şer û ajawê nehêle, ew yek bi tewahî di berjewendiya xelkê navçê û xelkê Îranê de ye, derheq vê yekê de em pêşwaziyê ji biryara hikûmeta nû ya Amerîkayê dikin, lê ew yek nahê vê watayê ku ew bernameya hemû jî here pêş, em wekî Kurdên Rojhilat rawestin û çaverê bin ku ew gemaro bikarin rejîma Îranê biherifînin. Em wekî Kurdên Rojhilat bona vê ku em bikarin ji derfetên guncaw ku di pêşerojê de têne pêş, bikarin yekgirtû û hişyar bin, bona vê ku xelkê Kurd li Rojhilat bikare li dijî Komara Îslamî xebata xwe bidomîne û bêje cîhanê ku mafê wan hatiye binpêkirin û daxwaza mafê xwe dike.

Pirs: Çima di stratejiya nû ya Amerîkayê de pêdagiriyê li ser kêşeya navikî yan rêkevtina Bercamê dikin, xwe binpêkariyên din ên Komara Îslamî jî hene ku di daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ jî hatine baskirin, bo çi pêdagirî nakin ser van mijaran û fokosa zêdetir li ser pirsa navikî ye?

Bersiv: Diyar e ku bas li ser beşên din jî dike, lê ya girîng û li pêşê bo Amerîka heya niha mesela Bercamê ye, û sedem jî ew e ku Bercam rêxweşker e, û li pêşerojê de dikare mehandina Oranyomê bi armanca çeka etomî dest pê bike, ya ku di vê rêkevtinê de zeq bûye, pirsa çeka etomî ye, renge jiber ku niha hemû dunya ji destê Kureya Bakûr de gîr kirine ku çeka etomî heye û gefan li Amerîka û cîhanê dixwe, lewra ew naxwazin ku Kureyeke din hebe ku destê wê bigihîje çeka etomî, lewra dixwazin rewşeke wisa bi ser de bînin ku lawaz bikin, ku destpêregihîştina bi çeka etomî ye, ya ku di vir de girîng e, û dike kêşeya herî li pêşê ku Îranê çêkiriye, pirsa bidestxistina çeka etomî ye ku hekî bi dest bînin, metirsiya wê bo Amerîka û hevalbendên wê di navçeyê de tê pêş ku yek ji wan Îsraîl e.

Pirs:Di daxuyaniya we de hatiye ku hûn pêşwaziyê ji stratejiya nû ya Amerîkayê dikin ew yek tê çi watayekê, hem pêşwazî û hem jî piştevanî?

Bersiv: Ew tiştên ku rejîma Îranê dike, eva ku hikûmeta nû ya Amerîka bas jê dike, çendîn sal e ku em bas jê dikin, me hawar kiriye ku pêşiya vê rejîma serberedayî bigrin, lê mixabin ku ew cureya hewce girîngî nedane gotinên me, û niha ku ew gotinên me dubare dikin, xwezayî ye ku me pê xweş be, jiber ku derdikeve ku ew jî gihane vê qenaetê ku rejîma Komara Îslamiya Îranê ne tenê bo xelkê Kurd û xelkê Îranê metirsîdar e belkû bo hemû cîhanê zirara wê heye, ew şer û tevdanîkariyên ku hene beşek ji wan vedigerin ser siyaseta destêwerdana Komara Îslamî ya Îranê, wekî min bas jê kir rejîma Îranê dijminê Kurd û azadîxwazên din ên Îranê ye jî, lewra dema ku dijminê me ji aliyê welatekî bihêz ve dikeve jêr tehrîman, derfeteke baştir ji me re tê pêş ku em xebata xwe li dijî vê rejîmê pêşve bibin, lewra xwezayî ye ku em pêşwazî bikin ji van bername û stratejiya Amerîkayê.

Pirs: Xaleke cewherî ya daxuyaniya we ew bû ku xelk li dijî Komara Îslamiya Îranê yek bigrin ku dijminê herî metirsîdar ê Kurd e, û piştî wê jî raya xelkê jî li ser torên civakî ew e ku xelk yekgitina hizban dixwazin. Gelo bersiva we bo vê yekê çi ye?

Bersiv: Rast e ku ji mêj ve ye xelkê Kurdistana Rojhilat daxwazkarê vê ne ku hêzên opozisyonê yek bigrin, û li vê derheqê de me jî ji mêjve hest bi hewcehiya cureyek yekgirtinê digel wan hizban de kiriye, û em kar li ser dikin, û di heyama yek du salên borî de pêngavên baş hatine hilgirtin, ji aliyekî ve digel hevalên berê ku ji me cuda bûne, me gotûbêj hene, û berdewam heyetên me hevdu dibînin, û digel aliyên din jî me karê hevbeş kirine ku bûne sedema lihev nêzîkbûnê. Bê guman ew çavnihêriya xelkê tewaw rast e ku dema em bas ji yekgirtina xelkê dikin, dibe ku em bixwe jî dest pê bikin. PDKÎ di vê derheqê de eva ku li ser milên wê ye, bi hestkirina bi berpirsyariyê ve encam daye, û herçend ku negihane hemû armancên xwe, lê bandoreke baş me hebûye li ser verevandina cureyek ji bedbînî û duberekî û dijminatîkirina yektir, lê ew yek têrê nake, û dibe ku zêdetir jî em hewl bidin.

Pirs: Dawî gotina we bi kurtî çi ye?

Bersiv: Cardin vê rastiyê bo xelkê têkoşer û azadîxwazê Kurd di Kurdistana Rojhilat dubare dikim, digel vê ku her derfetek tê pêş bikarin mifahê jê wergirin, lê nabe ku çaverê bin ku hikûmetên derve bên û Komara Îslamî ji bo me biherifînin yan Komara Îslamî neçar bikin ku mafê me bide, dibe ku em bixwe bibandor bin, û Rojhilat di xebata Rojhilat de, dibe bibe hêzeke bibandor. Da ku kom û komeleyên navneteweyî ên biryarder de hisabê li ser bikin û di guhartinan de me cihek hebe, em heya ku nekarin bibib ew hêz, hekî Komara Îslam lawaz û heya birûxe jî, em nikarin armancên xwe ku azadiya xelkê me ye bi dest bînin, lewra em nabe ji bîr bikin, berî her tiştî hesabê li ser xwe wekî Kurdê Rojhilat bikin, û em hemû bi hevre ji bo vê armancê kar bikin, û ew yek jî karê hizbek yan du hizb yan girûpekê nine, belkû karê me hemiyan e.

www.arsiv.pdkurd.org

Şikesta Kerkûkê destpêka rabûneke din



Cemal Resûl Dinxe

Dîrok hertim bi awayek ji awayan dubare dibe. Bûyera 25`ê Rezbera 1396`an (16.10.2017)`an rast bibîrhîner û dubarebûna dîrokê di cîhanê de, û bi taybetîtir ji bo neteweya Kurd bû.

Bûyerên dîrokî ên neteweya Kurd wekî şoreşa Şêx Se`îdê Pîran li 8`ê Şibata 1925`an, Mîrê Rewandizê 1826`an, Şêx Rezayê Dersîm 1937`an, Simayîlaxayê Simko 1918`an, Şoreşa Agirî 1927`an, Şêx Ubeydullahê Nehrî 1880`î, û Bedirxan 1821`an, Yezdanşêr 1853`an, Şêx Mehmûd 1918`an, Şêx Ehmed Barzan 1943`an, Şêx Ebdulselam Barzanî 1908`an, û Qazî Mihemed 1924`an, û tevgera azadîxwaziya Kurd hemû di têgehekê de cih dibin, "Ketin û rabûn".

Bûyera Kerkûkê di çarçoveya şirovekirina pirseke dîrokî hêsan e, û hemû takên Kurd, sexera xwe û rêberên Kurd dibin ku nediviya Kurd wan şaşiyên dîrokî ku çendîn carî ezmûn kirine cardin dubare bikin. Lê diviya ku em bêjin ku hemû şoreşên Kurd û şikestên wan ên niha jî Kerkûkê di biyavê derûnî de bandora xwe li ser hest û bîra neteweyî daniye, û serdemê xwe jî, şoreşên gelê Kurd bi vî rengî û heya vêdetir jî bandora xwe danîne, lê bi sedema vê ku "Hişyariya neteweyî" gellek lawaz bûye, û keresetên ragehandinê tunebûne, da ku ew rûdaw û bûyer bêne tomarkirin û bêne veguhastin, bi bêdengî, bixwe di nava hesta pirr ji derdê xwe de nuqim û bat bûne. Bûyera kerûkê li serdema niha de bi sedema pêşkevtina serdema me, hemû Kurdek han da ku kerkûk axa kurdistanê ye, û dibe ku tola wê hildin, û derheq vê bûyerê de xwe hevderd dizanin ku wate di hesta hevbeş de bi wateya piratîkî beşdar bûn.

Referandoma serxwebûna Kurdistanê bi cîhana derve ragehand ku Kurd îradeya xwe heye, û qedera xwe dinivîse. Ew yek li cem tu welatekî cîran û Rojava cihê baweriyê nebû, jiber ku neteweya Kurd ya serdema 19 û 20 nebû ku wan bîr jê dikir, lewra hekî em bêjin ku Rojavayî jî di hesabên xwe de derheq Kurd rastî şaşiyan hatine, ew yek dûr ji rastiyê nine, lewra referandomê karî ku siyaset û dîtingeha Rojava derheq gelê Kurd biguhere.

Şikesta hêzên pêşmerge jî, ew jî bi vî awayê nexwastî nikare referandoma serxwebûna Kurd, demserveçûyî bike, belku rastî ew e ku herçend encama referandomê nebû kiryar, lê pirojeya serxwebûnê nesekinye, û sergirtina vê armancê jî tenê demê dixwaze. Pirojeya Kurdan bi hikûmeteke tayifî ku bingeha wê milîşên Heşda Şe`ibî ne ku ser bi Spaha Pasdaran in, nahê ragirtin. Ya ku dikare serbixweyîxwaziya Kurdan ragire, cîbicîkirina sîstemeke sekolar, demokratîk û federal di çarçoveya dewleteke medenî de ye, ku hevwelatiyên erdnîgariya Îraqê bi bê berçavgirtina ayîn û mezheb û netewe di xwe de cih bike, ku ew yek jî tiştekî gellek dijwar tê berçav.

Piştî rûxana hikûmeta Sedam, hikûmetek di Bexdayê de hate ser kar, ku serbarê mezhebîbûna xwe, ser bi rejîma Îranê bû, ku ew jî kêşeyeke kûr bû, û di rastî de çavkaniya hemû kêşeyan bû.

Piştî van çend salan hikûmetdariyê li Bexdayê, tu riyek cuda ji serbixweyiyê nemabû, jiber ku Îraq di heyama çend salên borî de, bûbû navendeke tayifî ya Şî`e ku ser bi Îranê bû. Deshilata Şî`e bi serperestiya Îranê li serdema Obama de zêdetir xwe sepand û seqamîgîr bû. (Qise û lêkdaneweyên niha û derbazbûyî ên siyasetvanên cîhanê û bi taybetî siyasetmedarên Amerîkayê selmînerê vê mijarê ne).

Lewra heya wê demê ku Îraq di nava qofiya hikûmeteke mezhebî wekî rejîma Îranê de bimîne, pirojeya Kurdan dawî nahê, belkû di heyama bê de, wê şahidê bûyerên siyasî û leşkerî ên din di asta Îraqê û navçeyê de bin ku niha jî hişdarî didin ku xwe ji şer biparêzin.

Herwisa dibe ku em bêjin ku ji siyasetvanên kurdistana Başûr nahê qebûlkirin ku bêkar rawestin, û destên xwe ji Kerkûkê bişon, jiber ku ew bajar cuda ji vê ku çavkanieyeke bihêz ya aborî ye, bi şahidiya dîrokê



Kerkûk serbarê hemû pêkhateyan bajarekî Kurdistanî ye.

Serbarê vê ku rejîma Îranê dirêjiyê dide destêwerdanên xwe, û berdewam di hewla vê de ye ku duberekî û ajawê saz bike, lê bi vî halî jî dosiyeya Kurdan bi jidestdana Kerkûkê û heya kontrola bajarên Kurdistanê ve nahê daxistin.

Pirojeya kontrolkirina navçeyên Kurdistanî ên derveyî îdareya Herêma Kurdistanê pêştir pîlan jê re hatibû danîn, berpirsên Herêma Kurdistanê bas ji vê kiribû ku egera rûdaweke wisa heye, lewra digotin ku zimanê gefan tu tiştî çareser nake, û gotûbêj baştirîn rê ye. Herwisa pêştir jî bi serkirdayetiya Kurd hatibû gotin, ku ji van navçeyan vekêşin, û heya hêla kesk jî destnîşan kiribûn, ku sînorê 2003`an û rûxana Sedam e. Heya di dawî rojên zextên bo paşxistina referandomê, pêşniyara paşxistinê bo heyama hefte û mehan jî hebû, ku ew yek nîşan dide ku armanca wan dagîrkirina Kerkûkê berî birêveçûna referandomê bû, û rêgirtin bû ji encamdana referandomê di vî bajarî de, û paş referandomê jî her çi ku bangewaza diyalogê bû, ret kirin û pîlana êrîş û dagîrkirina Kerkûkê bi rêberiya Spaha Pasdaran cîbicî kirin.

Reftara eqlanî digel vê rewşa heyî de ji bo Kurd girîng e, û dibe ku hêla siyasî ya xwe wekî dewleteke medenî û demokratîk û xwedî rewşeke mêjûyî, ku çendîn pêkhateyên neteweyî û mezhebî, û îde û ayînan bi xwe ve digre, biparêze. Jiber ku Kurd li warê stretajiya neteweyî û jeopolîtîk de heya niha hejmareke giran e, û dibe di navxwe de, xwe bihêz bike û kêmasiyên derbazbûyî ên xwe çareser bike.

Herwisa di rewşekê de ku neteweya Kurd di şokê de ye, û di nava rûxana "mezinahiya neteweyî" ya piştî referandomê de dijî, berpirsyariya me ew e ku bedela vê ku ew bibin dadwer, bibin nojdar û perestar.

Erka exlaqî ya me di rewşekê de ku hebûn û nebûna neteweyî ya me di metirsiyê de ye, hebûn û yekbûn girêbesteke bilez ya civakî û derûnî ye ku em bi hev re bikarin ku vê kirîzê derbaz bikin, û ew yek girîng û bibandor e. Piştî derbazbûna ji kirîzê jî, bêguman dem heye bo hesabwergirtina ji afirînerên kirîzan.

Bûyerekî wekî Kerkûkê hekî dubare bibe, cihê qebûlkirinê nine, lê nabe em vê yekê jî ji bîr bikin, ku berî vê jî Kurdan qonaxên gellek hestiyar di dema 100 salên borî de birîne, lewra ew yek nabe bingeh bo dorandina Kurd, belkû dibe em bizanin ku siyaset demkî ye, û hertim "birin" nine, "dorandin" jî heye, rêbertiya Kurd dibe bizane ku yekdestiya hêza leşkerî karteke "birinê" ye, di leyîza siyasî de.

Rêberên siyasî ên kurdistanê gellek baş ji vê rastiyê dizanin û tecrube digel hemû hikûmetên zal bi ser Kurdistanê de hene, ku pirr e ji oportonîstî û peymanşikêniyê, û derevan ji aliyê dijminan û îxanetkaran ve, û her ew yek jî dibe bibe xalek ku "kêmtir xemî" gefek e li ser derfet û deskevtên kurd.

Kurd cardin xwe organize dike, û bo carek din jî xwe bi cîhan û navçeyê dide naskirin. Kurd herçend ku di dîrokê de derbên giran xwarine, lê ne tenê kol nedaye, û neketiye, lê belkû qahîmtir û biîradetir û tundtir ji berê dest bi xebatê kiriye. Dibe em vê yekê jî bêjin û vê rastiyê qebûl bikin, ku tenê tişta ku neteweya Kurd aram dike, ew e ku daxwazî û xwesteka wan cîbicî bibe, hekî ne wisa be,heya ku rewreweya dîrokê hebe, Kurd dev ji xwesteka xwe bernade û navçeya Rojhilata Navîn jî asayiş û aramiyê bi xwe ve nabîne.

www.arsivakurd.org

Nerîna Lîderan



Manûel Valls: “ Em rê nadin kurd bişkên”.



Lavrov: “Esed piştgiriya kongireya Sûçî dike”.



Jeff Sessions:“Trump dê guher tinan di dezgehên ewlehiyê de bikeariyê dike”.



John McCain: “Kurd hêjayî piştgiriya Amerîkayê ne”.

Wezîrê Derve yê Firansayê: Em nikarin destêverdanên rejîma Îranê di deverê de qebûl bikin

Rejîma Îranê tevî givaşên cîhanî û Herêmî, li ser dirustkirina alozî û destêverdan di welatên Rojhilata Navîn û kiryarên terorîstî berdewam e.

“Jan îyû Ludiryan” Wezîrê Derve yê Firansayê, di civîna Şêvra Pêwendiyên Derve yên digel Amerîka de gotiye ku: Çalakiyên rejîma Îranê, gefek in li ser Rojhilata Navîn û herwiha berevajiyê berejewendiyên Washington û Fransayê ne.

Rejîma Îranê di Rojhilata Navîn de, di pey berfirehkirina desthilata siyasî û leşkerî a xwe di deverê de ye, ji bo ber bi pêşvebirina têoriya xwe ya dijî mirovahiyê.

Wezîrê Derve yê Firansayê, di vê civînê de îşare bi çalakiyên alozkirinê yên Îranê di deverê de kiriye û ragehandiye ku: Em nikarin destêverdanên rejîma Îranê, û pawanxazî û zêdexwaziyên wan qebûl bikin.

Rejîma Îranê di dawîn destêwerdanên xwe di Îraqê de, bi çekdarkirin a “Heşda Şe`ibî” û fermandarîkirina wê girûpê, dest bi ser Îraqê de girtiye, û di çarçoveya siyasetên pawanxwazî û zêdexwazî yên xwe de êrîş ser Başûrê Kurdistanê dike.

Rejîma dagîrker a Îranê, li Rojhilata Navîn di welatên weke: Yemen, Sûriye, Behryên, Îraq û Filistînê de, ji aliyê siyasî û leşkerî ve piştevanî dike, û bi dirustkirina girûpên terorîstî, destêwerdanê di nava karûbarên wan welatan de dike, û herwiha mejûlî vê ye daku desthilata xwe di welatên Afrîqayê de jî zêde bike.



Herwiha “Lurdyan”, zêdebûna bernameyên navikî yên Îranê, wekî metirsyekê li ser civika cîhanê dide zanîn.

Eva di halekî de ye ku, rejîma Îranê tevî givaş û dorpêçên cîhanî ji bo bidawîanîn bi çalakiyên navikî û mûşekî yên xwe, her wek berê berdewam e.

Amerîkayê dorpêçên aboriyên li dijî rejîma Îranê dirêj kirin

Wezareta Xizînedariya Amerîkayê gemaroyên aborî ên pejirandî ên pêşîn dirêj kirin.

Li gora raporên belavbûyî roja Sêşemiyê 9`ê Rezbera 1396`an Waşintonê biryar da ku di çarçoveya yasaya naskirî bi “Katsa” (Xebata li dijî dijminên Amerîkayê ji riya dorpêçan ve) rîzbendek ji berpirsan û kompaniyayên Îranî ku digel Spaha Pasdaran a terorîst dest hene, xistin nava dorpêçan de.

Yasaya naskirî bi “Katsa” (Xebata li dijî dijminên Amerîkayê ji riya dorpêçan ve) bi taybetî li dijî rejîma Îranê û Kureya Bakûr tê cîbicîkirin. Ew biryar roja 11`ê Gelawêja 1396`an bi piraniya dengan di herdu meclisên Nûneran û Sinaya Amerîkayê de hatibû pejirandin. Li gora yasaya Katsayê, heyiya wan kes û kompaniyan di Amerîkayê de hatine bilokekirin, û tu Amerîkayiyekî mafê danûstandinê digel wan kesna nine, û herwisa ew kes nikarin bêne nava xaka Amerîkayê de jî.

Piştî vê biryara Amerîkayê pasdarê terorîst Ce`iferî fermandê vê rêkxirawa terorîstî got: Amerîka bi hêceta hêza mûşekî ya me, pirojeyasayek bi navê “Katsa” (Xebata li dijî dijminên Amerîkayê ji riya dorpêçan ve) li dijî Spaha Pasdaran cîbicî kir. Wî ragehand ku emê wekî namûsa xwe, ji hêza xwe ya mûşekî bergiriyê bikin.

Wezareta Xizînedariya Amerîkayê di daxûyaniyekê de belav kiriye ku rejîma Îslamî ya Îranê piştevaniya terorîzmê dike. Ew kesên ku dorpêçên aborî li dijî wan hatine dirêjkirin, ew in: “Mihemed Elî Ce`iferî, Yehya Rehîm Sefewî, Rostem Qasimî, Mihemed Hicazî, Perwîz Fetah, Murteza Rezayî, Ebdullah Îraqî, Elî Ekber Ehmediyan, Mihemedriza Neqdî, Husên Taib, Husên Selîmî û Ehmed Firûzendê”.

“Têrîza Mey”: Bo serxwebûnê dibe Kurd digel Bexdayê gotûbêjê bike

Serokwezîra Birîtanyayê “Têrîza Mey” derheq bûyerên di navbera Herêma Kurdistanê û hikûmeta navendî ya Îraqê de daxwaza rêkevtina siyasî ya bilez kir, û ragehand ku bo pirsa serxwebûnê dibe ku kurd digel Bexdayê gotûbêjê bike.

Parlemantarekî Partiya Parêzgaran (muhafizekaran) jî bi navê “Cak Lopirêstî” bas ji girîngiya rola pêşmerge kir, û ragehand ku, rola pêşmerge li şerê li dijî DAÎŞ`ê de bibandor bû, û pêşmerge bû ku bi şerê li dijî DAÎŞ`ê aramî vegerande kolanên Birîtanyayê jî.

Ji aliyekî din ve çend kongresmenên Amerîkayî jî, roja borî di konferaseke çapemeniyê de li pêşberî avahiya Koşka Spî piştgiriya xwe ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê û rola pêşmerge re rageahandin, û bi tundî Trump rexne kirin ku di hemberî destêwerdanên rejîma Îranê di nava karûbarên welatên herêmê û êrîşa Heşda Şe`ibî de bêdeng bûye. Herwisa wan ragehandin ku “Birêt Mekgork” zanyariyên nerast dane kabîneya Amerîkayê. Wan kongresmenan hinek wêne belav kirin ku nîşan dida fermandê Hêza Quds ya Spaha Pasdaran Qasim Silêmanî fermandehiya şerê li dijî Kurdan kiriye, û milîşên Şî`e jî siwarî tank û wesayitên Amerîkayî bûne, û bi wan trombêlên leşkerî êrîşî ser Kurdistanê kirine. Herwisa wan bas ji Ebû Mehdî Muhendis jî kirin ku serbarê vê ku kesekî terorîst e, lê digel Qasim Silêmanî fermandehiya şer li dijî hevpeymanên wan kiriye, û deshilatdariya Amerîkayê jî bê helwest e li hemberî vê yekê de.

Yek ji wan kongresmenan ragehand ku tu ferqek di navbera Heşda Şe`ibî û DAÎŞ`ê de nine, tenê yek ji wan Sunî ye, û yek ji wan Şî`e ye, û her du jî dijminatiya Kurdan dikin.

Herwisa bas ji vê hate kirin ku Îran dixwaze ji riya xeta Şî`e ve bigihîje sînorên Îsraîlê, û dibe Trump derheq vê yekê de helwest hebe.

www.arsivakurd.org

Mes`ûd Barzanî weke pêşmergeyek wê li ser karê siyasî berdewam be

Mes`ûd Barzanî serokê Herêma Kurdistana Başûr, bi belavkirina peyameke dîrokî, dest ji kar kêşa.

Nûçegihanên Hikûmeta Herêma Kurdistanê, belav kirin ku: Di şeva derbazbûyî de, 7`ê Xezelwera 1396`an de, Mes`ûd Barzanî, serokê Herêma Kurdistana Başûr, bi awayê fermî dest ji pileya serokatiya Herêma Kurdistanê hilgirit, û desthilata xwe dabeş kir.
Mes`ûd Barzanî, tevî ewê ku heyama serokatiyê ji bo 8 mehên din hatibû dirêjkirin jî, lê belê navbirî ev biryara red kir.

Navbirî bas ji vê yekê kir ku: Ew weke pêşmergeyek di nav gelê xwe, û pêşmergên ezîz de, li ser xebat û têkoşanê ji bo bidestanîn mafên rewa yên gelê kurd û berevanîkirin ji destkevtên neteweya me berdewam dibe.

Serokê Herêma Kurdistanê di beşeke din a axavtinên xwe de, bas ji vê yekê kiriye ku: Me wisa dizanî ku Civata Navneteweyî rêz ji bo qurbanîdana gelê Kurd digire, û Bexada jî wefadar dibe, lê belê mixabin me dît ku her di vê demê de hemû hewla wan eva bû daku wan hewlan bi qazanca xwe tewaw bikin.

Barzanî bas ji vê yekê jî kir ku ewên ku Amerêkayê ew weke terorîst binav dikirin, me dît ku siwarî tankên "Ebramiz" bûn û êrîşê ser kurdistanê kirin, ev xwe cihê pirsiyarê ye.

Herwih navbirî derheq rewşa niha a Kurdistanê, bas ji vê yekê kir ku: Îmkan nine em rewşa niha a Kurdistanê qebûl bikin û Kerkûk nasnameya Kurdistanê ye, û mirinê hildibijêrim û nahêlim kerameta me bişkê.



Desthilgiritin ji kar bi tu awayekî babeteke asayî nine di Rojhilata Navîn de, û eva jî hûnereke ku kêm kes di jiyana xwe de encam dide, Mes`ûd Barzanî yek ji rêberên Kurd di Rojhilata Navîne de ye, ku dest ji posta mezin weke rêberê welatekî bi awayekî Demokratîk hilgirt, û heta îzin neda ku endamên malbata wî jî xwe ji bo posta serokatiya Herêma Kurdistana Başûr berbijêr bikin.

Mes`ûd Mistefa Barzanî, 16`ê Tebax 1946`an di bajarê Mehabad a Kurdistana Rojhilat de hatiye dine, û di hilbijartinên serokatiya Encumena Nîştimanî a Kurdistanê de, di 12`ê Hezîrana 2005`an de, weke yekem serokê Herêma Kurdistanê, ji aliyê Encûmena Nîştimanî a Kurdistana Başûr ve hate hilbijartin.

Katalonyayê serbixweyiya xwe ragehand



Roja Înê 70 endamên parlementoya Katalonyayê dengê "Erê" dane serxwebûna herêma Katalonyayê, û tenê 10 dengê "Na" hebûn.

Serbarê vê ku dewleta Îspanyayê dijayetî digel birêvebirina referandomê kiribû, lê deshilatdarên herêma xwebirêveber ya Katalonyayê pêdagirî li ser referandomê kirin û roja 9`ê Rezberê referandom di herêma xwe de bi rê ve birin. Di wê referandomê de ku %43 ji wan kesên ku mafê dengdanê hebûn beşdarî kirin, %90 ji wan dengê "Erê" dane serbixweyiyê.

Niha hêzên polîsê Îspanyayê avahiya Wezareta Navxwe li Katalonyayê dorpêç kirine, û Dadgeha Yasaya Bingehîn jî sê roj derfet daye Katalonyayê ku ragehandina serxwebûnê hilweşîne.

Berdevkê serdozgeriya Îspanyayê jî ragehandiye ku ewê dozê li dijî serokê Herêma katalonyayê bi tohmeta serhildanê vekin.

Ragehandina serxwebûnê di demekê de bi rê ve çû, ku welatên Firansa, Îngilîs, Alman, Amerîka û serokê Komîsyojna Ewropayê ragehand ku ew serxwebûna wê herêmê bi fermî nas nakin.

Îspanyayê di sala 2006`an de, hinek deshilat dane herêma Katalonyayê, û xelkê wir jî wekî "netewe" bi nav kir, lê xelkê wir, ser vê baweriyê ne ku serbarê vê ku herêma wan, xwediyê %20 a berhemanîna nexalis a navxweyî ye, û beşa herî dewlemend ya Îspanyayê di warê pîşesaziyên wekî pîşesaziya hesin, xûrak, dermanan û pîşesaziya kîmyayî ye,û di biyavê torîsmê de jî dahateke baş heye, lê hikûmeta Îpanyayê heqê wan nadê,û wan diçewsîne.

Di sala 2014`an de referandomek ji bo serxwebûnê di herêma Katalonyayê de bi rê ve çû, ku rêberên vê herêmê, ew referandom wekî rapirsiyeke nefermî bi nav kirin, wê demê tenê 1 li ser 3 ji wan kesên ku mafê dengdanê hebûn, tê de beşdarî kirin, û %80 ji beşdaran dengê "Erê" dane serxwebûna Katalonyayê. Di hilbijartina parlemanî ya sala 2015`an de jî,partiyên cudahîxwaz %48 a dengan di hemberî partiyên alîgirê Hikûmetê de bi dest xistin

Dorpêçên nû yên Amerîka li dijî Îran û Hizbullahê

Pêştî îlankirina stratejiya nû a serokomarê Amerîkayê derheqê rejîma Îranê de, tewahiya sazî û rêxisitnên hikûmetî yên wî welatî bi awayekî bilez û berdewam mijûlî lêkolîna li ser stratejiya nû a Amerîka ne.

Li gora rapora nûçegîhaniya "Reuyters"ê, hejmarek ji parlemantarên Amerîkayê 3 pirojeyasayên nû derheqê danana dorpêçên berfireh yên li dijî Îran û Hizbullah a Lubnanê, radestî Parlemana wî welatî kirine, û her 3 terh di roja Çarşemî 4`ê Xezelwerê de bê tu djiyayetiyekê hatine pejirandin. Herwiha li gora van pirojeyasayên pêşniyarkirî hemû kes, sazî û kompaniyên ku di dabînkirina çavkaniyên aborî û herwiha rakêşana hêza mirovî de, digel Hizbullahê alîkariyê bikin, wê bikevin bin dorpêçana de.

Pejiradina wî terhî piştî axavitinên "Mich Pens", cîgirê serkomarê Amerîka, di merasima bîranîna êrîş a li ser binkeya hêzên deryaî ya Amerîka di Bêyrûtê de hatibû encamdan, û îlankiribû ku Amerîka bêkar narûnê, daku Ayetûllahên ku di Tehranê de ne, pîlana êrîşeke din li dijî wî welatî dabirêjin.

Herwiha pirojeyasaya duyem îşarê bi cinayetên şer yên Îran û Hizbullahê dike, û li gora wê pirojeyasayê Îran û Hizbullaha Lubnanê, bi sebeba mifahwergiritina ji hemwelatiyan, weke mertalên mirovî, dikevine ber dorpêçan û terha sêyem jî ji NY dawxaz dike daku Hizbullaha Lubnanê bixe nav rêzbenda girûpên terorîstî de.

Girîngiya wan terhan di vê yekê de ye ku, ne tenê bi berfirehkirina asta dorpêçan zêde kiriye, belku bi gişt saziya Hizbullahê weke girûpeke terorîstî nas kiriye û dixe ber dorpêçan de.

Hêjayê gotinê ye ku, terha çaremîn jî di destûra karê Parlemana nûnerên Amerîka de ye, ku derheqê bernameya mûşekî a Îranê de ye, û herwiha ev pirojeyasa bi armanca kêmkirina bernameyên mûşekî yên Îranê hatiye dirustkirin, û baleke taybetî dide mûşekên ku hêza hilgiritna "kulahek"ên navikî hene.

www.agirisiyasi.org

Nûnerê Welîyê Feqîh yê bajarê Urmiyê biryarek li dijî hemwelatiyên Kurd derxis



Ajansa Kurdpa: Nûnerê Weliyê Feqîh yê bajarê Urmiyê bûyera azara cînsî a li ser dersxwaneka Kurd û nerazîbûnên piştî vê bûyerê bi fitne dide zanîn.

Li gora nûçeya gihîştî Ajansa Kurdpa, Se`îd Mehdî Qoreyşî nûnerê Weliyê Feqîh yê bajarê Urmiyê, di gotinên xwe yên roja Înê 5`ê Xezelwera 1396`an de, nerazîbûna hemwelatiyên Kurd li hember azara cînsî a li ser keçeke temen 12 salî ji aliyê xizmetkarê xwandingeha "Rahê Şoheda" de nebaş da zanîn.

Navbirî bas ji vê yekê kiriye ku: Ev bûyerane cihê baweriyê nînin, û dibe ku berpirs bi awayekî tund li dijî vê yekê ravestin, lê belê nabe ku hinke kes jî jê mifaha şaş wergirin, kesê tawanbar dibe ku radestî dadweriyê bê kirin, ne ku bi sedema vê kiryarê tirombîlan agir berdnê, û canê xelkê bixin metrsiyê de, û ew yek nayê qebûlkirin.

Nûnerê Weliyê Feqîh tekez kiriye ku: Hekî destdirêjî li ser namûsa Turk, Kurd, Şî`e û Sunî hate kirin, nabe xelk dakevine kolanan, û tirombîl û xwendingehan agir berdinê, ev kesên ku wan aloziyan dirust dikin mehkûm in.

Di roja Duşemî 1`ê Xezelwera 1396`an de, piştî azardana keçeka kêm temen ji aliyê xizmetkarê xwendingê yê Turk ve, hemwelatiyên bajarokê Îslamava a girêdayî bajarê Urmiyê, piştî bihîstina vê kiriyara qirêj, xwendingeh û avahiya wî xizmetkarê Turk û heta binkeyeke besîcan di vê pêwendiyê de agir berdanê.

Di vê pêwendiyê de, hêzên Îtila`atê di heyama du rojên derbazbûyî de, êrîş kirine ser malên hejmarek ji hemwelatiyên akincî ên bajarokê Îslamava, û ev binçav kirine.

Di rojên derbazbûyî de, hêzên Îtila`atê, gef li malbata wê keça 12 salî ku destdirêjî lê hatibû kirin xweribûn, ku hekî ew di vê pêwendiyê de, digel medyayan gotûbêjê bikin, ewê bêne dadgehîkirin.

Yekîtiya Pîşeyî a Mamostayên Kurdistanê, destdirêjiya bo ser keçeke dersxwan şermezar dike

Yekîtiya Pîşeyî a Mamostayên Kurdistana Îranê, ji ber bûyera li xwendingeha "Rahê Şoheda" ku yek ji xwendingehên bajarê Urmiyê ye daxuyanyek belv kir.

Deqa daxuyaniyê bi vî awayî ye:

Xelkê xwedîşeref ê Kurdistanê!

Mamosta û dersxanên ezîz!

Di rêkevta 29`ê Rezbera 1396`an de, di Xwendingeha "Rahê Şoheda" a di taxa "Kuştargah" a ser bi bajarê Urmiyê, ji aliyê karbidestekî besîcî yê wê xwendingehê ve, destdirêjiya cînsî tê kirin bo ser keçeka temen 12 salî a pola pênçem a destpêkî ya wê xwendingehê.

Herçiqas berpirsê vê xwendingehê ji kiryara qirêj a wî besîcî haydar bûye, lê belê bi gefan vê keça dersxwan ber bi mala wê ve dişînin, û gef jê hatine xwarin daku bas ji vê kiriyara qirêj ku derheqê wê de hatiye encamdan ji bo malbat xwe neke. Lê belê malbata wê dersxwanê, vê kiryarê dûr ji mirovahiyê dizanin, û herçiqas ku doz li dijî vê kiryara destdirêjiyê ya wî besîcê rejîmê tomar dikin, lê belê ji aliyê dezgeha ewlekariya rejîmê gef li malbata wê tê xwarin, daku dest ji vê dozê bikêşînin, lêbelê di 1`ê Xezelwerê de, hemwelatiyên bajarê Urmiyê ji vê kiryara nemirovane a wî besîcê rejîmê di vê xwendingehê de haydar dibin, û êrîşê dikin ser vê xwandingehê, û daxwaza sizadana wî besîciyê dikin. Lêbelê tu bersivek ji hemwelatiyên aciz û nerazî re nayê dan, û ev jî neçar dibin, beşek ji vê binkeya bêexlaqiyê agir berdinê.

Yekîtiya Pîşeyî a Mamostayên Kurdistana Îranê, nerazîbûna xwe li hember vê kiryara qirêj a wî besîcê rejîma Îranê nîşan didin, û daxwaz ji mamostayan û dersxwan û xelkên xwedî şeref yên Kurdistan û bixasmanî yên bajarê Urmiyê dikin bi lidarxisitna nerazîbûnên komî, kiryara besîcê rejîmê di xwendîngehên Rojhilata Kurdistanê de eşkere û şermezar bikin.

Yekîtiya Pîşeyî a Mamostayên Kurdistana Îranê
2`ê Xezelver a 1396`an

Wênegirekî Kurd şeş sal sizaya girtîgehê bi ser de hate sepandin

Ajansa Kurdpa: Dadgeha Înqilab a bajarê Urmiyê, wênegirekî Kurdê xelkê bajarê Pîranşehrê, bi 6 sal û 3 mehan girtîgehê mehkûm kir.

Li gora rapora gihîştî Ajansa "Kurdpa"yê, wênegirekî Kurd xelkê bajarê Pîranşehrê yê bi navê "Se`îd Ehmedî" kurê Mihemed piştî 8 mehan bêçarenivîsiyê, 6 sal û 3 meh hukmê girtîgehê bi ser de hate sepandin.

"Se`îd Ehmedî" di dadgeha Înqilab a Urmiyê de, bi tohmeta alîkarîkirin digel yek ji partiyên Kurd yên opozisyona Hikûmeta Îslamî a Îranê hatiye girtin.
Di roja Înê 2`ê Reşemeha 1395`an de, hêzên Îtila`atê, êrîş kirin ser dukana wênegirê Kurd a bi navê "Nice" û ev binçav kiribûn. Çavkaniyên nûçegihaniya "Kurdpa"yê, piştrast kirin ku malbata "Ehmedî" xwediyê derbazbûyiyeke siyasî ye û bavê wî jî di destpêka şoreşê de ji aliyê hêzên ewlekarî yên hikûmeta Îranê ve hatiye bêserûşûnkirin, û birayê Se`îd jî, di sal borî de, ji zanîngeha Urmiyê hatibû derxistin.



Her di vê pêwendiyê de, roja Sêşemî 2`ê Xezelwera 1396`an de, taya yekem a Dozgeriya leşkerî a Urmiyê, serbazê Kurd yê bi navê "Sidîq Eynî", bi bê hebûna parêzvanê destnîşankirî, 10 sal cezaya girtîgehê û dûrxistina bo girtîgeha bajarê Erdebîlê mehkûm kirin.

Dozgeriya leşkerî a Urmiyê ev serbazê Kurd bi tometa sîxorîkirina ji bo yek ji partiyên Kurd yên Opozisyona hikûmeta Îslamî a Îranê, mehkûm kirin.

Ev hukmê giran yê dadgehê bi bê amadebûna wî serbazê Kurd di dadgehê de hatiye dan, û ev di roja Pêncşemî 4`ê Xezelwerê ji sepandina vî hukmê giran yê girtîgehê hatiye haydarkirin.


www.firsatkurd.org

Îranê piştî mirinê qedexe danî ser pirtûkên Derwîşiyan

Wezareta Kultura Îranê belavkirina pirtûkan derbarê jiyan û berhemên nivîskarê navdarê Rojhilatê Kurdistanê Elî Eşref Derwîşiyan de qedexe kir.

Nvîskarê pirtûka "Naskirina Elî Eşref Derwîşiyan", Areş Sencabî ragihand, ji 10 salan ve wî daxwaza moletê bo belavkirina wê pertûkê kiribû, lê piştî 10 salan jêre gotine ku nabe ew pirtûk were belavkrin.

Sencabî dibêje, ew 9 salan li benda pêdaçûna pirtûka wî bû, lê ew dezgeha weşanê ku biryar bû pirtûka




wî belav bike, ragihand ku êdî ew hewla wergirtina moletê bo wê pirtûkê nadin. Bi gotina Sencabî, ew dest ji belavkirina wê pirtûkê bernade û careke din wê daxwaza moletê bike.

Elî Eşref Derwîşiyan, roja Pêncşema heftiya derbasbûyî li bajarê Kerecê koça dawiyê kir. Wî bêhtir ji 50 pirtûkên roman, çîrok û lêkolînên keltûrî bi zimanê farsî belav kirine.

Dezgehên ewlekarî yên Îranê rê nedan ku termê wî li bajarê Kirmaşanê cihê jidayîkbûna wî were veşartin. Ew li Kerecê hat veşartin û di merasîma veşartina wî de tu berpirsekî Îranê beşdar nebûn.

Lê hejmareke mezin ji xelk, nivîskar û çalakvan beşdar bûn, û Elî Eşref Derwîşiyan wekî nivîskarekî azadîxwaz û xwazyarê dadperweryê dane naskirin.



Çîroka Demirtaş dibe fîlm

Parlementerê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) yê Enqerê Sirri Sureyya Onder diyar kir: "Emê çîroka Selahattin Demirtaş bikin fîlm."

Sirri Sureyya Onder ji rojnameya Cumhuriyetê re ragihandiye: "Ji dema ku min di nav vê partiyê de dest bi siyasetê kir heta niha bi sedan, bi hezaran dostaniyên min ên nemir çêbûn. Lê rehenda dostanî û piştevaniya ku min bi Selahattin Beg re pêk anî, gellek cuda ye."

Onder herwiha diyar kiriye: "Di demên herî aloz a Tirkiyê de me bi hev re siyaset kir. Wezareta Dadê rê nade ez Selahattin Beg bibînim. Min jî bi rêya parêzer û hevalên ku diçin cem wî, her dem pêşniyara nivîsandinê kir."

Li ser pirsa "Gelo emê projeyên nû yên Demirtaş bibînin?" Sirri Sureyya Onder wiha bersiv daye:

"Belku emê ji pirtûkeke wî bikevin rê, belku jî Selahattin Beg dê ji me re surprîzek bike û çîrokeke nû binivîse. Emê çîroka Selahattin Demirtaş jî bikin fîlm. Eger ew jî bipejirîne, ezê bibim derhênerê fîlmê. Qonaxa nivîsandin û çêkirinê, emê bi hev re çareser bikin. Rudaw



www.arsivakurd.org

Zimanê Kurdî

Qursên Kurdî, A. Karabax

1

A) Beşên Hokeran :

Hoker, li gor çawanî û erkên xwe li pênc beşên bingehîn dabeş dibin :

1. Hokerên çawaniyê(çawanî, wesfîn) :

a. Piraniya peyvên van ji rengdêrên wesfîn pêk tên. Ji aliyê peyvsaziyê ve ev, bi gişti bêguhartin bikar tên û çawaniyên çalakiyan didin nasîn.

b. Bo kifşkirina peyvên wan, pirsên bi (çawa/çawan, çilo/çiton, çi, hwd) li lêkerên pêveberî tên kirin.

Ji hokerên çawaniyê : Dereng, zû, tenê, bi tenê, bi misogerî, bêşik, teqez, bêguman, tavil, edîbane, evdalkî, hêdî hêdî, lez, bi lez, wirane, hwd.

a. Ji wan ên ku bi alikariya daçekê(bi) çêbûne : Bi lez, bi misogerî, bi tenê.

b. Ji rengdêrên çawaniyê yên bingehîn : Bilind, biçûk, mezin, xweşik, hwd.

Mînak 515 : Hokerên çawaniyê : Çend bikaranîn :

a. Gulçîn hêdî hêdî dimeşiya. b. Rojda û Nalîn bi lez dimeşiyan.

c. Niha ev keç bi tenê dixebite. ç. Gul û Gulçîn xweşik dikenin.

2. Hokerên demê(demkî, demîn) :

a. Ev hoker ji aliyê demê ve çalakiyan didin nasîn.

b. Bo kifşkirina peyvên van, pirsên bi (kengî, çi demê, çi wext, hwd) li lêkerên pêveberî tên kirin.

c. Dem, li sê beşên sereke dabeş dibin : Dema niha, dema borî û dema bê. Peyvên demîn, bi van beşan ve têkildar in.

Ji hokerên demê : Îro, duh, pêr, sibehê, sibeh û êvar, sibehê zû, zû, roj bi roj, rojekê, êvarkî, berê êvarê, nîvro, piştî nîvro, gav, wext, berî bîskekê, saet, bi saetan, meh, îsal, par, biharê, havînê, payîzê, zivistanê, hwd.

Mînak 516 : Hokerên demê : Çend bikaranîn :

a. Nalîn berê êvarê dixebite. b. Ew her sibeh diçe kursa dantêlê.

c. Rojhat wê havînê li mala kalê xwe dima. ç. Wî li wir bi roj kar dikir.

3. Hokerên cih û bergehê :

a. Ev hoker ji aliyê cih û bergehê ve çalakiyan didin nasîn.

b. Bo kifşkirina peyvên van, pirsên bi (li ku, li kuderê, ji ku, ji kuderê, di ku de, bi ku ve, ji ku ve, hwd) li lêkerên pêveberî tên kirin.

Ji hokerên cih û bergehê :

a. Ji yên cihê : Vir, li vir, wir, li wir, pêş, li pêş, paş, li paş, jêr, jor, nêz, derdor, dûr, her derê, dereke din, li çepê, li rastê, hwd.

Tiştonek



A: Mahir Berwarî

Metelokên xizmanê

Ev meteloke girêday têkelî û peywendiyên malbatî ne.
Gelek zarok bêy bersiva van metelo-ka bizanin, êkser
bersiv didin, dibe ev bersive axaft-inên pîs bin û neguncin
li gel meteloka, zarokên dî sixirka/ hetka wî/wê dibin û pê dikenin.

- Bi şelê te, bi şerwalê te, xizmê xalê te, bête mala te, dê çi deyê? (* Bab e) (* Hinek axaftinên pîs dibêjine xwe bêy pê bizanin. Hetka wan diçît)

- Mêrdî bûkî nenkit, hate malit, çî edeytê? (* bawik/bab)

- Take xûşkî xalt e, pûrrîşit niye? (* dayik)

- Kurî bawkt e, kurî daykt e, biraşit niye? (* xot/tu bi xwe)
- Şîrînok li darînok, darînok li gobe-lok, gobelo birê ket,dunigo pê ket? (* doşav, pale, hêstir)

- Du jin a digotine du mêr a: Hern kurên me, werin mêrên
me, babên hingo xezwîrên me.
(* Du mêra jin bi jinî bi daykên wan kirbû.)

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

www.arsiv.kurdiki.org

Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (313)

Asime Cehangîr: Îdamkirin û binpêkirina mafê kêmaniyan di Îranê de berdewam e

Reportera taybet ya mafê mirovan Asime Cehangîr di rapora xwe ya şeş mehên destpêka sala 2017`an de, ragehand ku ew nîgeranê îdaman di Îranê de, û binpêkirina mafê kêmaniyên olî di vî welatî de ye.

Asime Cehangîr ragehand ku di Îranê de îşkenceya derûnî û fîzîkî berdewam e. Birîna endamên leşê mirovan û heya derxistina çavê tawanbaran wekî qesas dirêjî heye. Girtî jî di rewşeke nebaş de ne, û alîkariyên pizişkî nagihîjin destên wan.

Derheq destbiserkirina rojnamevanan jî, wê ragehand: 12 rojnamevan û 14 çalakên torên civakî hatin destbiserkirin, û destbiserkirin û îşkence û dadgehîkirina kêmaniyên olî jî wê nîgeran dike. Derheq rewşa jinan jî di Îranê de, Asime Cehangîr ragehand ku mafê jinan di gellek biyavan de tê binpêkirin.

Di hember axavtinên Asime Cehangîr de, Mihemed Hesenînijad nûnerê rejîma Îranê, ew rapor siyasî xwend, û ragehand birêveçûna hilbijartina serkomariyê û şêvran di Îranê de, nîşana başbûna rewşa mafê mirovan e, û serkomar jî bi qewlên ku di warê parastina mafê mirovan de dane xelkê, kariye serkeve.

Navbirî ragehand ku wê demê ewê bihêlin reportera mafê mirovan serdana Îranê bike ku ji bo 192 welatên din jî biryarekî weha bihê dayîn.



Koşka Spî: Tramp daxwaza hevdîtinê ji Ruhanî nekiriye

Koşka Spî roja Duşemiyê ew îdiaya rejîma Îranê ret kir ku meha borî Tramp daxwaza hevdîtinê ji Ruhanî kiribe.

Sara Hakbî Sindirz berdevkê koşka spî bi NBC ragehand ku Tehranê derev kiriye.

Nûçegihaniya Fars di raporekê de belav kiribû, ku serkomarê Amerîkayê di Civata Giştî ya NY de daxwaz kiribû ku Rûhanî bibîne.

Behram Qasimî berdevkê Wezareta Karê Derve ê rejîma Îranê roja Yekşemiyê di konferanseke çapemeniyê de ragehand: Amerîkayê daxwazeke bi vî awayî ji me kir, ku serkomar ew daxwaza wan ret kir.

Tramp destpêka meha Octoberê rêkevtina navikî ya Îranê ret kir, û pêdagirî kir li ser cardin sepandina tehrîman li dijî Îranê.

Di sala 2013`an de Obama û Hesen Rûhanî di dema sefera serkomarê Îranê bo Amerîkayê, pêwendiyeke telefonî encam dabûn.

Çend dehik dibe ku pêwendiyeke bi vî rengî di navbera serkomarên Amerîkayê û Îranê de tunebû.



Heya niha çendîn carî serkomarê Amerîkayê ragehandiye ku rêkevtina navikî bi Îranê re, xiraptirîn rêkevtin bûye, û rakirina tehrîman li ser rejîma Îranê destê wan zêdetir vekir bona destêwerdanên navçeyî, bi awayekî ku niha di hewla têkdana aramiya hemû herêmê de ye.

UNSCO: Di deh salên borî de 930 rojnamevan di asta cîhanê de hatine kuştin

Rêkxirawa zanistî-rewşenbîrî ya NY amara kuştina rojnamevanan li raserî cîhanê de, di heyama deh salên borî de belav kir.

Rêkxirawa zanistî-rewşenbîrî ya NY (UNSCO) li bajarê Bon ya Alman ragehand ku di heyama salên 2006-2016`an, 930 rojnamevan li sertaserî cîhanê hatine kuştin, û sedan rojnamveanên din jî birîndar bûne.

Li gora amara UNSCO`yê tenê di sala borî de, 102 rojnamevanî jiyana xwe ji dest dane, ku ji vê hejmarê zêdetir ji 94 kes ji wan rojnamevanê xwecihî bûn.

Ew rêkxiraw ku ser bi UN`ê ye, di raporekê de Efxanistan, Mekzîk, Yemen, Îraq û Sûriye di refa herî pêşê ya wan welatan de nav biriye, ku di wan welatan de metirsî li ser canê rojnamevanan hebûye, û zêdetirîn rojnamevan tê de hatine kuştin.

Îraq di sala 2016`an de, wekî welatê herî bixwîn bo rojnamevanan hatiye binavkirin, ku zortitîn rojnamvean tê de hatine kuştin.



www.arsivakurd.org